 *Dr. Sozdar Mîdî (E. Xelîl)*

 *wergera ji erebî: Mustefa Reşîd*

# Tîrêjên Çarşembê

## Xelek - 28

# Ronahiyek li Şaristaniya Sûmerî
# (Dewlet - Civak - Zagon)

Hin pêşiyên Kurdan, hin dewlet avakirine ku nawenda wan li dervayî erdnîgariya Kurdistanê bû. Ji wan yên here navdar evin: *Sûmerî* li başûrê Mêzopotamiya, *Kaşşî* li nawend û başûrê Mêzopotamiya û *Eyyûbî* li Misir, Sûriya, Libnan, Filestîn, Urdin, Hîcaz û Yemenê. Di dîrokê da pêkhateyên şaristanî yên van dewletan bûye beşek ji bermaya wan welatên ku nawenda wan dewletan li wir bû.

Sûmerî ji erdnîgariya şaristaniya Guzana ya li çiyayên Kurdistanê daketibûn başûrê Mêzopotamiya. Hên di wê şaristaniya Guzana da şoreşeka çandiniyê pêkhatibû, û bi wê ra pêşketineka civakî, mîtologî û endazyarî (avakirina avahî û xaniyan) hevaltiya wê kiribû. Dema ku Sûmerî gihîştin warên xwe yên nû, bi xwe ra gênên şaristaniya Guzana anîbûn û paşê li wir, di wê demê da, navdartirîn şaristanî li rojavayê Asiyayê afirandin. Emê li jêr hin pêkhateyên wan bînin ber çavan.

## Dewletên Sûmerî:

Bi gelemperî, sazûmana siyasî li welatê Sûmer sazûmana "dewlet-bajar" bû. Her bajarekî mezin wek *"Erîdû" (Eridu), "Ûr" (Ur), "Ûrûk" (Uruk), "Îsîn" (Isin), "Kîş" (Kish), "Larsa", "Legeş" (Lagash) û "Nîpûr" (Nippur)* li gel herêmên derdora xwe dewleteka serbixwe pêkdianî. Tevî ku Sûmeran hest bi wê yekê dikir ku ew ji yek nijadî û kulturê ne, lê di navbera van dewletan da dijberî û pevçûn hebûn û şerê hev jî dikirin. Ti dewletan ji van dewletan nikarîbû desthilata xwe bavêje ser dewletên din û dewleteka nawendî gewre avabike[1].

Eve bîreweriya çiyayî serhişk ku ji yekîtiyê bazdide û naxwaze têkeve bin desthilata dewleteka nawendî gewre. Dîsa ev bîrewerî bi xwe ye ku, di dema xwe da, li welatê Yûnan jî hebû. Heya niha jî Kurd bihayê vê bîreweriyê didin. Ev bi temamî bi vajayî bîreweriya biyabanî ye. Hema dema ku Akkadiyên biyabanî nawenda Mêzopotamiyayê xistin bin desthilata xwe, dewleteka nawendî bi rêveberiya Sargonê Yekem (Sharruken / Sargon) li dor sala 2350-î b.z. avakirin, dewlet-bajarên Sûmeran yên li dijberî hev dagîrkirin, û bi darê zorê xistin bin kelîja dewleta akkadî.



Padîşahê sûmerî Godiya

Serdarê Sûmeran yê di asta here bilind da jêra digotin "*Lûgal" (Lugal)* û ji serdarê di jêr wî ra digotin "*Ensî" (Ensi).* Li welatê Sûmer parlemena here pêşîn (civatên dewan û şêwirmendiyê) peyda bû ku ji du civatan pêkdihat: Civata Rihsipiyan (kesên temen pir û astbilind) û civata gel. Civata dewan û şêwirmendiyê yekem civîna xwe li bajarê *"Ûrûk" (Uruk)* li dor sala 2700 b.z. di dema padîşahê xwe yî navdar "*Galgamêş*" da pêkaniye. Gelek belge ji wê yekê ra hene ku sazûmana siyasî sûmerî sazûmaneka demokratîk bûye. Hin dîrokzanan ew bi navê "*Demokratiya Destpêkî*" bi navkirine[2].

Dîroknas Samuel Kreimer dibêje: "**Serdarên welatê Sûmer yên pêşîn - çiqas asta wan di şer û cengan da bilind ba jî - ew ne zordar bûn, ne bê ĥed û sînor bûn û ne padîşahên xwedî desthilatiyeka razber bûn. Ew di mijarên tirsnak yên girêdayî dewletê û bi taybetî mijarên şer û aştiyê da bi kesên xwe yên astbilind di civîneka rêzgirtinê da dişêwirîn. Ev civînên dewan û şêwirmendiyê hên di destpêka dîroka sûmerî da pêş pênc hezar sal pêkdihatin**"[3].

## Civaka Sûmerî:

Raste ku civaka sûmerî civakeka çînayetî bû (serdar, oldar, şervan, bazirgan, karker, kole), lê belê ew civakeka vekirî bû; di wê da Sûmerî û biyanî bê cudahî bi hev ra dijiyan. Jin li ba Sûmeran serwera malbatê bû û mehirkirina pir jinan ne rewa bû; tenha di rewşên awarte da heger mirovekî dewlemend û astbilind ba. Di wê rewşê da dikarîbû çend cariyan bibe[4].

Dîrokzanê Firensî Georges Roux dibêje: "**Civaka sûmerî di heyama berbanga civakan da ji civakeka destpêkî pir pêşda çûbû; ew bi temamî hatibû organîzekirin, heya bêhtirî pêwîst jî. Gelê Sûmer gelekî çalak bû û xwediyê bîreweriyeka bîrokratîk bû û wisa ji bo me bi hezaran belge, tablo û bawernameyên civakî, aborî û bazirganî hiştine**"[5].

Pêşengên civaka sûmerî herdem hewldidan ku rewişt û tîtalên payebilind di civaka wan da serdar bin. Pendeka sûmerî dibêje: "**Divêt tu li tenikhalan bibanî û miqate bî, belengazan stûxwar nekî, bi karên rind û qenc rabî, di her rojekê da alîkariyê pêşkêş bikî, nav û dengê xelkê xirab nekî, qenciyan bike, fesadî û mizêwiriyê neke, ji xelkê ra herdem peyvên xweş bêje**"[6].

Di helbesteka sûmerî da hatiye:
"**Xirapiyê bi dijminê xwe jî neke!**
**Yê ku ziyanê jî digihîne te pêra baş be!**
**Bi dijminê xwe ra jî dademend be!**
**Qencî bextewarî û kamiraniyê bi xwe ra tîne!**"[7].

Wisa tê xuyakirin ku ev rewişt û tîtalên payebilind ku herdem doza aştiyê dikin, di civakên pêşiyên Kurdan da xwedî rahên kûr bûn. Piştî du hezar sal, ew di ayîna yezdanî da hatine xuyakirin û pêximberê mîdî Zerdeşt ew di pirtûka xwe ya pîroz da (Avesta) civandine.

## Yasaya Sûmerî:

Civaka sûmerî civakeka organîzekirî bû, maf ji erkan dihatin cudakirin. Di wê da dadegeh hatibûn damezrandin daku pirsgirêkên civakî çareser bikin. Ev rastî di baldariya wan da bi derxistina zagonan tê xuyakirin. **Zagonên Orkagîna** li bajarê *Legeş* (2365 - 2357 b.z.) hatine dîtin, zagonên **Ornammû** (2059 - 2041) li bajarê *Ûr*, û zagonên "**Lipit-Ishtar**" (1934 - 1924 b.z.) li bajarê *Îsen* hatine xuyakirin. Lê belê, padîşahê babilî *Hammurapi* zagonên xwe di sala 1770-î da derêxistine û sûd ji zagonên Sûmer wergirtiye[8].



Padîşahê sûmerî Ûrnamo

Tiştê balkêş ewe ku zagonên Sûmer xwedî taybetmendiyên mirovî bûne. Di wan da prînsîpa bedeldayînê heye; yanê dayîna diravan li cihê cezayê laş. Li jêr hin nimûne ji zagonên *Ornammû*:

- "**Heger kesekî kepûyê (difin, poz) kesekî din gez kir, cût û jêkir, hîngê divêt ew kes diraveka ji zîv bide kesê din. Ji bo çav jî diraveka zîvî. Ji bo diran (didan) nîv dirav û nîv dirav jî ji bo guh**".

- "**Heger kesekî tiliya kesekî din birî, divêt ew sê çarîk diravê zîv bide yê din**".

- "**Heger kesekî kesekî din avête erdî û destê wî şikand, divêt ew diravek ji zîv bide yê din**"[9].

Lê belê, di zagonên Hammurapi da prensîpa cezayê laş heye (çav bi çav, diran (didan) bi diran (didan).

Evin hin nimûne:
- "**Heger xaniyek hilweşiya û kurê rûniştivanê xanî têda mir, cezayê vê yekê kuştina kurê endazyarê ku ew xanî avakiriye ye**".
- "**Heger kesekî li keça kesekî din da û ew jinik mir, divêt keça kesê sûcdar jî bê kuştin**".
- "**Heger kesekî di bin sûndê da kesekî din sûcdar kir û li wî wek tawanbar gilî kir, lê nikarîbû behane û belgeyan bîne, cezayê wî kuştine**".
- "**Heger kesekî çavê kurê kesekî din derêxist (kûr kir), divêt çavê kesê sûcdar jî bê derêxistin**".
- "**Heger kesekî hestiyê kesekî din şikênand, divêt hestiyê wî jî bê şikênandin**"[10].



Hammurapi zagonan ji Xweda Şemş werdigire

Cudahî di navbera zagonên Sûmer û zagonên Babil da, di bingehê da, cudahiya navbera çanda şaristaniya *Guzana* û çanda biyabanê ye. Pirsgirêk jî ewe ku çanda biyabanê ya tund dikarîbû bi darê zorê civakan bike yek û dewletên nawendî avabike.

Çarşemb, 07.10.2015

## Jêder

[1] Sabatino Moscati: Şaristaniyên Samiyan yên kevin, rûpel 67. Seyid Mehmod El Qimni: çîroka afirandinê, rûpel 20

[2] Gean Bottero û yên din: Rijhilata Nêzîk û Şaristaniyên Destpêkî, rûpel 82. Amer Suleyman, Ehmed malik El-Fityan: Semîner di dîroka kevin da, rûpel 84. Sami Se'id El-Ahmed: Sûmerî û bermaya wana şaristanî, rûpel 127, 128. Wei'h Bashur: Sûmer û Akkad, rûpel 101, 113.

[3] Samuel Kreimer: Ji tabloyên Sûmer, rûpel 78-79.

[4] Ralf Lenton: Dara Şaristaniyê, rûpel 228, 235. Sami Se'id El-Ahmed: Sûmerî û bermaya wana şaristanî, rûpel 125. Hasan Nihme: Berfirehiya Mîtologiya û afsaneyên gelên kevin, rûpel 20.

[5] Georges Roux: Îraqa kevin, rûpel 186.

[6] Georges Roux: Îraqa kevin, rûpel 144.

[7] Sabatino Moscati: Şaristaniyên Samiyan yên kevin, rûpel 91

[8] Samuel Kreimer: Ji tabloyên Sûmer, rûpel 115. Tawfik Suleyman: Lêkolîn li şaristaniyên rojavayê Asiyayê yên kevin, rûpel 109, 174. Ebdulhamid Zayed: Rojhilata Hemdem, rûpel 180.

[9] Tawfik Suleyman: Lêkolîn li şaristaniyên rojavayê Asiyayê yên kevin, rûpel 174, 181.

[10] Muhemmed Beyyûmi Mehran: Dîroka Îraqê ya kevin, rûpel 275, 276, 247. Tawfik Suleyman: Lêkolîn li şaristaniyên rojavayê Asiyayê yên kevin, rûpel 196, 197, 200.